

Leşfirotin an laşkirîn?

»»» R:9



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

*Duhestînameyek Siyayasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (422) 22.05-2022 Buha (1000) Tûmen*

**Serhildan bo nan e, yan
bo sernixûniya dîktatoriyê
ye?**

»»» R:3

**Ziman stûna ragirit-
na her neteweyekî ye**

»»» R:5

**Rejîmê dîsa lat û lût li dijî
xwepêşanderan bi kar anîn!**

»»» R:7

Volkanên Bêzariyê

Di heyama rojên derbazbûyî de, Îbrahîm Re'îsî, serkomarê rejîma Tehranê, serdanek nişkêve bo parêzgeha Urmiye pêk anî û bilî vê ku peravêzên wê serdanê bixwe cihê nîqaş kirinên taybet bixwe ne, gelek bi êşkere got: Ez paşeroja welat gelek geş dibînim. Em li ser hêlêne û di wê meydanê de ku, xelk û em hebûna me heye û meydanê vala nakin û karên xwe ber bi pêş ve dibin!

Ev serdana navbirî bo beşek ji Kurdiştanê, ev jî di demekê de ku Îran bi giştî digel komê guherînkariyên kûr rûbirûye û li bingeha xwe de dibe bi pirsyar!

Di serobendekê de ku nirxa fermî a ard û çendîn hewcehiyên din yên xwarinê yên xelkê ragihand û weke ku ev bixwe dibêjin emeliyateke aborî encam dane û xelk derkevtiye li ser şeqaman heta ku meha Banemera sala 1401'an jî li rojmêra şoreşa Îranê de, bixînin li kêlega roj û mehên Xezelwera sala 1398'an û Befranmbara sala 1396'an. Vê carê xelkê bi hince-ta qutkirina hewsar



û nemana beşek ji hewcehiyên jiyana xwe û piçûktirbûna sîfêkên wan li herêma El Ehwezê serhiladan kirin û dengê xwe gihandin bi Lurîstan, Kohîgiluyê û Çarmahal û ber bi çendîn bajar û parêzgehên din jî xwe havêtiye û ji vê hewlê mifah vergirtin da ku, carek din bi-qîrin: “Mîrin û neman bo rejîma Îslamî”, her çawan ku dihat çavnhêrikirin bersiva deştilatê her weke tev carên din wiha bû, li serkutkirin û zalkirina rewşek ewlehî û qutkirina hêla internetê û deşteserkirina beşek ji nerazîbûnan. Çavnhêriyek ku saziya NY ya Çavdêra Mafê Mirov anî li ser hêlê û ragihand: rejîma Îslamî bi mifah vergirtin ji amûrên tundtîjiyê û çekên kujer hewl

dide da ku nerazîbûnên xelkê Îranê serkut bike”.

Lê, liderheq serdana Re'îsî bo Kurdiştanê û çûna wî bo bajarê Mehabadê dibe em wê raştîyê bizanibin ku, armanc ji vê serdanê, nek weke bêbêjin hewlek bona ave-dankirin û guhdan bi daxwazkariyên xelkê ye belku, serdanek bi tevahî siyasî û ewlehî ye. Berî her tiştî Mehabad bajarekî stratîjîk ya Kurdiştana Rojhilat e ku komêk bûyerên girîng ên siyasî û dîrokî vir hatine afirandin ku, her yek ji wan bûyeran bandor hem li ser Kurdiştanê û hem jî herêmên din yên Kurdiştan û Îranê daniye. Her ev pîrsa jî wisa kiriye ku bibe cihê baldana deştilatên

yek li pey yek ên zal û di hemem demê de jî, temsîliyêk bona îradeya neteweyî li Kurdiştanê de.

Di vê navberê de pîrsek din ku, dibe ji vir bê kirin ku girîngiyek taybet bixwe heye ku pêka belgeyan, cihê rûniştîyên neteweyan di çarçoveya Îranê de xwdiyên kanga û binerdên dewlemend û serkaniyên avê yên mezin û erdê bi ber-eket, ev samana ji aliyê deştilata naven-dî û mafyayên girêdayî deştilata Tehranê tîn birin û herçend ku, he-jarî her niha de ku pel li ser tev civaka Îranê de havêtiye lê, rêreva wê di nav neteweyên kolonîkirî de çend qad ji navendê zêdetir e.

Demaku wiha ye eger li bajarên weke Îsfahan û Tehran û ... hwd, xelkê bona daxwazkarina nan derdiekvine li ser şeqaman eva xelkê herêmên Îranê û bitaybet Kurd li Kurdiştana Rojhilat tenê şerê nan nakin belkûser-tir li nan Kurd hizir li azadiyê dike ku xwarina can û rewabûn û weke çawa ku berê nîrxên giran jêr daye vir şûnda jî amadeye nîrxê bo bide, her bi vê sedemê ye serdana

Re'îsî bo Kurdiştanê nek ji tîrsa serhildana xelkê bo nane belku li tîrsa vê ye ku Kurd weke çawan berê jî mînak û sermeşq bûne bo neteweyên din yên li Îranê de bûye bo azadî û bideştveanîna mafên xwe, ewa weke hewlek vebiguhesî heta carek din li dijî koloniyalîzima nav-endê serhilde û re-jîma Îslamî li di agirê darekêş bikî û vem-randin vê gelek zehmet dibe. Serdanaeke bi wî rengî rêkdixîne da ku pîlanek nû bona rûbirûbûna digel nerazîbûnan dabirêjin ku wisa danîne ku Kurdiştanê li serhil bide û belavbûna seranserê Îranê de di vê demê de tex û bextê Cema-ranê dişewitîne. Li ser hev yak u virda ku dibe em hemi weke raşt û çandêke siyasî û civakî pêka pelê bin eva ku tenê rê û kanale bona derbasbûn li nehametiyên zal û tenê rêrewa gihîştin bi bexteweriyê, bi bê vê ku, wêneya mirovekî di mehê de bê dîtin, gotara şeqamê ye! Dema ku wisa ye, bi her bîr û baweriyek û ramanek ku heye li ber bi dijayetiya rejîma Îslamî de cih bigire ku tenê rêya derbasbûna me ye.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Ji demaku Xamineyî bûye Welîyê Feqî yê wê pergala kolonyalist a terorîstê, heftî û meh nebûye ku di nîqaşkirin û axavtinên xwe de behsa dijmin neke.

Ew canliberê nexweş ku çar-enivîsa bi milyonan mirovî li welatê bela lêdayî yê Îranê ketiye ber destê wî, bi awayek berdewam behsa vê yekê dike ku, dijmin mejûlî raçandina pîlanên li dijî wî ye!

Dijmin dixwazin êrîşî li ser gel bikin û gel jî nav bibin! Gel hîlbixelîtînin! Bi kurtasî ya ku di mejiyê vala û paremayî yê Xamineyî de diqewm e, deq bi deq şerekî, derûnî, aborî, ewlehî, leşkerî, olî û kultûriye ku, dinavbera dujîm û gel de tê lidarxistin.

Zelal û eşkere ye ku, mebesta Xamineyî jî “gel” ev mirov nînin ku, li hûndirî cografîya Îranê de dijîn. Ya ku di wêjeya dirûst û lojîka mirovahiyê de ye, gel jî gelê nişteciyên welatekê re dibêjin!

Xamineyî bixwe bi sedan jî wan mirovan îşkence dike û destûra kuştina wan dide û her di vê heyama nexsweşiya Koronayê de, pêka amarên nefermî 800 hezar kes jî wan mirovan, bi sedema ser hişkiya Xamineyî canê xwe jideşt dan.

Dema ku wiha ye di nav mejiyê Xamineyî de, gel Xamineyî bixwe ye.

Dijmin jî, tev ev mirov in ku, dixwazin bi wateya peyvê

Dij û min



dij û min, dijberiya canliberekî bi navê Xamineyî bikin, her bi vê sedemê ye ku, ev şera li hûndirî mejiyê Xamineyî de dimeşe, şerek di navbera Xamineyî û tev ewên ku wiha lidijî wî dirindeyî ne.

Ji bo naskirina sîmaya raşteqîne ya dij û min ên Xamineyî, hewce ye ku, mêzeyî bûyerên herêmê bikin.

Dema ku xelkê Îranê derdikevine li ser şeqaman û siloganên lidijî Xamineyî diqîrin, çarstûnên laşê Xamineyî direcîfin.


Dema ku xelkê Îraqê, bitaybet li herêmên Şî`e meseb yê aliyê xwarê li Îraqê, jî destûpeywendiyên rejîma Îranê re deng nadin û girûpên girêdayî rejîma Îranê şikestên siyasî dixwen, Xamineyî nîv rihî dibe.

Demaku li Lubnanê her girûpek çî mesîhî bin û çî Sunî meseb yan jî Şî`e meseb bin an bi her awayekî nêzî Îran û rejîma Xamineyî bin, dengê wan jî kêmiyê dide, di parلمانê de lawaz dibe û piştî Xamineyî direcîfe.

Ew bûyer, helwest û nîgeraniyên han Xamineyî û sîstema komara Îslamî jî me re dibêjin ku, herçend ku Xamineyî û rejîma wî jî mûşekên balîstîk, balafirên Amerîka û Îsraîlê ditirsin, lê, ya ku wekî dijminê şerekî yê xwe dibîne, hişyarbûna xelkê ye!

Xamineyî û sîstema kolonyalistî ya desthilatdar li ser Îranê de, hez ji şer, alozî û kuştinê heye lê, tev bi tarîti û bi kêşûhewayê şelo û ne zelal cîbicî bibe.

Her core zelalbûna rewş û hişyariyê, xelkê dijminê şerekî ên xwe dizanin û weke rehniya berfê jê ditirsin!



Serhildan bo nan e, yan bo sernixûniya dîktatoriyê ye?



N: Noredîn Sofîzade

Di heyama wan 44 salên deshîlata rejîma Melayan de, ku wekî teyrekê şewê "Peleşemk" perê reş ê xwe li ser Îranê de kêşaye, xelk ji mafên herî destpêkî ên xwe hatine bêparkirin, azadiya siyasî, olî, hizbî, hizrî, civakî, netewî, çandî, sinfî, aborî, hatine bêparkirin û heçî kes û aliyekî behsa wan mafan kiribe, bi sûçê lidijî nizamê, sîxorên byaniyan, tohîn bi rêber, şer li dijî xwedê "Muharib" li dijî şoreş, minafîq û li dijî ewlehiya netewî, cezayê herî giran bi ser de hatiye sepandin, ku sêdare, gullebarankirin, îşkence, hepsa dirêj heyam û dûrxistin bûye.

Di wî heyamî de gelek caran xelkê li dijî wê dîktatorî û bêdadiyê serî hildane û berxwedane, lê mixabin, gelek nekêşaye ku girseya serhildan û nerizayetiya xelkê hatiye tepeserkirin, lê, ev bi vê wateyê nebûye ku rejîm serkevtî bûye û kariye bi yekcarî dengê nerizayetiye kip bike.

Mînakên herî berçav jî, serhildana xwendikaran a li 8'ê Tîrmeha 1999'an, Nerizayetiya seranserî ye piştî hilbijartina serkomariyê di sala 2009'an de, serhildan Xezelwera 2019'an li derheq giran bûna nirxa Benzînê û herwisa dehan nerizayeti û serhildanên herêmî neteweyên bê maf wekî, serhildana xelkê rojhilatê Kurdistânê bona nerizayeti li hemberî girtina Ebdula Ocelan rêberê PKK ê di sala 1999'an, nerizayeti bi hilkevta kuştina hovane ya lawekî Kurd li Mehabadê



bi navê Şivane Seyîdqadirî, çendîn caran xwenîşandana xelkê herêmên El Ehwezê û Belûçîstanê li dijî zilma rejîmê ji wan netewane ye.

Yêk ji pîrsgirêkên herî sereke ku rejîm dikare wan xwenîşandanan tepeser bike, mixabin nebûna yek dengiya seranseriyê, ev mînakên ku li jorê amaje pê hatine kirin, nerizayeti, yan xwenîşandanên hêminane nebûn, belkî hemî serhildan û şoreş bûne, ewa jî jibîlî xwenîşandanên berdewame sinfên cuda cuda bona daxwaziye mafê xwe wekî Mamoste, kirêkar, jin, xwendîkar, karmend û yên dinê ye.

Pirsyar ewa bû ku, çima ev serhildan û şoreşa xelkê Îranê yêkdest nine û tu caran nabe seranserî, ku bê guman hekî carekê bibe seranserî, êdî rejîm nikare tepeser bike û dê bibe sedema sernixûniya yekcariya wê rejîma dîktator. Bersiv renga bal hemî kesê hebe ku, bi raya min sedemên sereke evin: Nebûna hevahengiya seranserî bona danana pilana serhildanê.

Nebûna hêleke rohn ku xelk bo xwe bike platform. Nebûna alternatîf anku biguherînên rejîmê.

Tirsandina xelkê ji ewa ku li egera nemana wê rejîmê, renga Îran wekî Sûriye jê bê. Nebûna piştewaniya derekî. Nebûna hêz û aliyekî siyasiya

bi hêz a opozisyona seranserî ku xelk peyrewiyê jê bike.

Tirsa neteweya serdest anku Fars ji perçe perçe bûna Îranê li egera sernixûniya rejîmê. Belê ku wisaye çî rêkek dimîne pêşya xelkê ku bikarin stûnên kela zordariya wê rejîmê biherifînin?

Bersiva wê pirsyarê jî renga cem zaf kesan hebe, lê ez bawerim rêçara sereke bo serkevtinê ewin:

Hekî çî navengerayên şivînism ji tirsê perçe nebûna Îrana xwe ya ezîz amadene hemî dîktatorî û rezaletê qebûl bikin, lê, aliyê kêma neteweyên weke Kurd, Belûç, Erebi, Azerî, Tirkîmen, ku %70 heşemeta Îranê pêk tînin, hekî bikarin bernamê û rêberî û hevxeberiyekî micid gel hev çê bikin, bê guman ewa hezkin dê bikarin bikin û ne rejîm û ne bîroka panîranîzmê nikarin tepeser bikin.

Mixabin dema ku bi her hincetekê gelên weke, Erebi, Kurd, Belûç û Azerî, di yek ji navçeyên taybet bi xwe li dijî rejîmê serî hildidin, tu caran neteweyên hevçarenivîs ên din bona piştewanîkirina wê neteweya serhildayî pêngavek nehavêtine û tenê maye û rejîmê bi hemî hêza xwe ve di heyamê çen rojan de tepeser kiriye.

Niha ku ev çen rojin xelkê parek ji bajarên başura Îranê ku, bêtir bajarên neteweyên

bêmafîn, serhildan kirine, hekî çî ev pîrsa ku wan li ser xwenîşandan kirine, taybet bi wan tenê nîne û mesela seranserî ya xelkê Îranê ye, lê, dîsan ew nerizayeti ji çen bajarên biçûk derbas nebûye.

Renge îrorojê xelkê Tehran, Meşhed, Tevrêz, Îsfahan, Şîraz, Qezwîn, Qom û yên dinê ji hemî kesî zêdetir ezaba rewşa xerab a aborî dikêşin, lê, amadene hemî dijiwariyekê bikêşin, bîrsî, bêkar, hejar, zobale gerd, dizî, û dehan rojreşiyên dinê qebûl bikin û amadene bin sîbera wê dîktatoriyê de bi serşorî bijîn ku kerameta miroviya xwe jî ji dest bidin, tenê ji tirsê hindê ku renga li egera sernixûniya rejîma dîktatora Axundî de, neteweyên bê maf ên Îranê jî bigihîjne mafê destpêkî ên xwe.

Lewma kite çareser ewe ku hemî neteweyên bê maf ên Îranê û part û aliyên siyasî wan, carekê bo hemî caran gel hev rêk bikevin û tu caran benda navend gerayên şivînism û piştewaniya derekî nemînin, ger tifaqek di nava wan neteweyan de bê çêkirin û bibine hêzekî xwedî şîyan, bêguman ruyê meselê hingê bi temamî dê bête guherîn û hem dê piştîvaniya derekî peyda bibe, hem jî pareke zaf a netewaeya serdest dê lahiya bike ku tu derî jêre wekî, û hem bê guma ev hêz û hevxeberî dê gelek zû bikare bi ser dîktatoriya îslamî de serkeve.

Biyareke dîrokî li Dadgeheke Beljîka li dijî 4 terorîstên Îranî



N:Azad Kurdî

Ji sala 2018'an heta vê mehê, pêvajoya mehkemekirina 4 terorîstên rêjîma Îranê bibû rojeveke germ li Beljîka û Ewropa jî. Bi keyfxweşî ve, dezgeha serbixwe ya dadê li Beljîka biyara dawî li ser 4 terorîstên rêjîma Îranê yekalî kir û hefteya borî bi fermî ragehand.

Dadgeh li bajarê Antwerpen ê Beljîka rêve diçû.

Tawanbarê sereke 'Assadollah Assadi' yê ku bi nav dîplomatê rêjîma Îranê li Viyena paytextê Austurîa bû, tawanbarê serekî û rêxistina kiryara terorîstî bo ser civîna Rêxistîyan Mucahidîn Xelq a Îranê di sala 2018'an de li derdora bajarê Parîsê bû. Terorîst « Assadi » bi 20 sal cezayê girtîgehê hate mehkûmkirin.

Herwiha 3 hevwelatîyên Beljîkî – Îranî di dosiyeyê de weke hevkarên 'Assadollah Assadi' hatin mehkemekirin. « Amir Saadouni, » yê 42 salî û hevjinê wî « Nasimeh Naami » her yek bi 17 û 18 salan cezayê girtîgehê hatin mehkûmkirin. Kesê sêyem « Mehrdad Arefani » ku xwe wekî helbestvan û çalakvanê siyasî dinasand, wêngirê hêzên opozosiyona Îranê li Beljîka û welatên derdor bû bo dema çendîn salan ku karê sîxorî bo Wezareta Îtîlaat a rêjîma Îranê dikir.

Navborî jî 17 sal ceza jê re hatiye birrîn. Girîngtir jî vê yekê, Dadgeha Beljîka mafê hevwelatîbûnê Beljîkî ji wan 3 sîxor û terorîstên rêjîma Îranê wergirt û piştî cezayê zindanê, dê bo Îranê bèn



şandin.

Ligel ku van 4 salên borî rêjîma Îranê bi hemû awayên pêwîst hewil da ku ev dadgeh rêve neçe û çî biryarek neyê derxiştin, lê dezgeha serbixwe a dadê li Beljîka neçû bin barê çî gef û hewildaneke derveyî dadê.

Ev dadgeh û biryarên wê dîrokî bûn bo hemû azadîxwazan û goriyên destên terorîzma rêjîma Îranê li hemû cîhanê. Herwiha rûreşîyeke mezin bû bo karbidestên rêjîmê û têkçûneke girîng bû bo derxiştina rûyê raşteqîne yê terorîzma rêjîma Îranê di asta navdewletî de ku hemû bi nav dîplomatên vê rêjîmê mijûlî karê sîxorî û terorîstî ne.

ww

Dadgeha serbixwe ya Beljîka bi piştraştbûna bi peywendiyên telefonî di navbera wan 4 kesan û hevahengî ligel Wezareta Îtîlaat a rêjîmê, herwiha gelek belgeyên girîng û îfadeyên tawanbaran ev biryar li ser wan der kir.



Ziman stûna ragiritna her neteweyekî ye

N: Bêhzad Qadirî

W: Hesên Mukerem

Ziman

Mirov canlibereke ku bi mifah vergirtin ji sîstemeke gelek pêşkevtî bo peywendî-girtinê wate “Ziman”, ji canliberên din cuda dike. Ev sîstema vê şiyane dide mirov ku bikare zanyariyên derdora xwe verbigire û wan zanyaran bo mirovekî din veguhese.

“Ziman” du erkên binge-hîn heye: Ya yekem eve ku ev şiyane daye bi me da ku digel kesên din peywendî lidar bixînin û bi wî awayî zanyarî, dîtingeh û ramanên xwe veguhesin an jî hemer tiştî ji keseke din verbigirin, ya duyem eve ku şiyane hizir kirinê daye bi me.

Zimanê dayîkê

Zimanê dayîkê an zimanê yekem ji yekem zimanê re tê gotin ku, zarok fêrî axavtinê dibe, bi wateyek din zimanê dayîkê wate zimanekê ku zarok bo yekem car pê qise dike û ji rêya vê hizir dike.

Roja cîhanî a zimanê dayîkê 2'ê Reşemehê ji aliyê saziya cîhanî a “UNESCO” ve weke roja cîhanî a zimanê dayîkê hatiye binavkirin. Ev roja li konferansa giştî a UNESCOyê ya li sala 1999'an de bi mebesta alîkarîdanên cud bi ziman û culture hate dest nîşankirin. civîna giştî a Saziya NY bi sedema girîngiya zimanê dayîkê, sala 2008'an weke sala cîhanî a ziman binav kir.

Her di vê derheqê de jî, saziya cîhanî a UNESCOyê ragihand ku: Her takeke civakê ku nekare bi zimanê dayîka xwe bixwîne û binvîse, nexwande van tê hesabkirin.

Girîngiya zimanê dayîkê Zimanê dayîkê û fêrbûna bi zimanê dayîkê, bandoreke gelek zêde li ser kesayetiya her takekê dadinê. Zimannas, jîngehnas û derûnnas li ser vê

baweriyêne ku mozîk' reng û ciwaniya dengê dayîkê, heta dema ku zarok li zikê dayîka xwe de ye jî, jêre vediguhese. Wate beşek ji mîratek ku zarokek digel xwe tîne bi dinyayê, koma xezîneya zimanê dayîkê ye, pêka vê zarokên sava li hember dengê dayîkê zêdetir ji dengê her mirovekî din bertekê ji xwe nîşan didin, her di vê peywendiyê de, yekemîn xaneyên çêkirina zarokan li derheq wan bixwe de û cîhana derdora wan, li ser binge-ha zimanê dayîkê şewazê verdigire, her bi vê sedemê jî zarok yekem ezimûna derûnî û naskirina xwe li cîhanê, bi zimanê dayîka xwe tîne ziman.

Civaknas jî li ser vê baweriyê ne ku, zimanê dayîkê digel şîrê dayîkê tevîlî canê zarokê û bi mirinê jî ji laş derdikeve û sepandina zimanek din li ser zarokek ku ji nû ve fêrî axavtinê bûye, weke tawan tê hesabkirin.

Ziman û hizir kirin

Yekyek ji wan mijaran ku li dîrokek gelek dûr de xelkê bawerî pê hebûye eve ku, “hizir” piroseyeke ku girêdayî ziman e. “Êştî Bêrig li pirtûka xwe ya binavê Derûn-nasiya ziman de raman û hizirên zaniştîne û baweriya wan wisa ye ku hizir piştî vê girêdayî bi ziman e, û li ser çar girûpan de hatiye parvekirin ku wiha ne:

-girûpek ku li ser vê baweriyêne berhemên ziman û reftarên din, tiştên wisan ku jêrxana hizirê pêk tînin. Girûpek li ser vê baweriyêne, ziman jêrxana binge-hîna hizirê ye.

Girûpek li ser vê baweriyêne, sîstema ziman û rêzmana her takekê, şewaza dîtingeha wî/ê takî li derheq cîhanê de dest nîşan dike.

Girûpek li ser vê baweriyêne, sîstema ziman û rêzmana her takekê, kultûra wî/ê takî dest nîşan dike.

Vegeşînkirina ziman hevterîbiya vegeşînkirina hizirê ye, an heta vegeşînkirina ziman pêştir e. Ziman şewazê dide bi hizirê. Herwisa mirov bi çêkirina kompeyvê dikare handerên derdorê nas bike û wan rêx-istîn bike. Eger mirov şiyane rêxistînê tune be, jiyana wî/ê rastî bêsêrûberiyê dibe, wate mirov pêka vê yekê bala hinek ji diyardayan dide û girîngiyê bi hinek din dide. Yekek ji taybetmendiyên mirov evin kudikare bi mifah vergirtin ji peyvan, kompeyvan çê bike. Lev Vygotsky li ser vê baweriyê ye ku: Hizir tenê ji rêya ziman ve nayê gotin, belkû, hebûn jî ji ziman çavkaniyê verdigire ... peywendiya hizir û ziman peywendiyekê jiyan bexşe, wate hizir bi mifah vergirtin ji peyvan jidayik dibe. Herwisa Whorf li ser vê baweriyê ye ku: Zimanê her mirovekî, çawaniya hizirkirina wî mirovî dest nîşan dike.

Ziman û netewe

Ziman hilgirê hizir û kultûra her neteweyekê ye. Demaku behsa girîngiya dîroka neteweyekî tê gorê, ev zimane ku derbasî û herniha ya wê neteweyî bi hevdure girê dide. Bi wateke din ziman ji sereketirîn faktorên hebûn û nebûna neteweyanin. Her di vê derheqê de Mahatma Gandhi

rêberê siyasî û me`inewî yê Hindiyên gotiye: Mirovek ku ziman û wêjeya xwe nexwandibe, dîroka xwe nizane û yê ku dîroka xwe nezane paşerojek wisa jî tunabe.

Milan Kundera nivîskarê navûdeng yê xelkê welatê Czechoslovakia gotiye: Yeke-mîn pêngava bo jinavbirina neteweyekî, qutkirina ve-bîranîna wî ye. Dibe pirtûk, kultûr û zimanê wî/ê bîn jinavbirin. Dibe mirovekî diyar bikin ku pirtûkên nû ji wan re binivîse, kultûrek destkirî bo wan dabinê, dîrok û zimanek nû bo dabinê, piştî heyameke kurt ev netewe

kêye û kê bûye jibîr dike. Herwisa cînhana derdorê, tev tişt bi lezigînyeke zêddetir jibîr dike. Jon Stewart felesofî British gotiye: Eger dagîrker bixwaze neteweyekî bike pişt guhê xwe ve havêje, li destpêkê de dibe êrîşî li ser nasname û zimanê wê bike û hewl bide ku wê asîmîle bike. Neteweyek ku kultûr û zimanê xwe jideşt bide li nav neteweyekê din de dimeh e.

Em û zimanê me

Di dirêjahiya dîrokê de hewlek zêde hatiye dan ku asîmîlekirina ziman û kultûra Kurdî, neteweya Kurd dinav neteweyên serdest de bimehînin. Lê, girîngtirîn faktorek ku heta niha izin ji wan re nedaye, zimanê me bûye, herçend ku carê jî zimanê me gefeke zêde li sere û zirarek zêde jê ketiye. Dagîrkarên Kurdistanê bona mehandina neteweya Kurd dinav xwe de, bi awayek berdeham û bi şeweyên cuda cuda êrîşî li ser ziman û kultûra me kirine. Bo mînak faşîsma Îranî her-tim hewl daye ku Kurd weke gelê Îranê an jî di bin siya rejîma Îranê de pênase bike û bi awayek berdeham zimanê Kurdî weke devokek ji zimanê farsî pênase dike. Û herwisa yekek ji girîngtirîn amûrên wan bona mehandina gelê Kurd sepandina zimanê Farsiyê.

Lê, ya ku erke, hewl û têkoşîna tak bi takên me ye. Demaku zimanê me dinav malbat û civaka me de giirngiyê pê bidin û wê biparêzin vê demê metrisiya li ser kêmbûnê dibe û pîlanên dijmn dibin bi bilqên li ser rûyê avê, di vê navberê de jî çîna xwandevar ya civakê barê wî giran e. Di dawiyê de dibe baş bizanin ziman stûna ragirtina netewe ye, û herwisa ziman ev nasnameya girînge ku eger vê neparêzin û hewl nedin bona vegeşîna vê, bi derbasbûna demê û piştî guhertina zimanê me, tev pênaseyên din ên me dê bîn doradin û bimehin.

Krîza devberdana sermayeya mirovî li Îranê

N: Namo

Di heyama wan çend salên dawiyê li Îranê de, rêjeya koçberbûnê bûye kirîzek civakî. Piştî şoreşa gelên Îranê ya li sala 1357'an, çendîn şîpelên koçbebûna welatiyan li Îranê rû dan.

Şîpela yekem bi sedems siyasî, koçberan ji karbideştên hikûmeta Pehlewî bû ku, bi sedema deştîbikar bûna dadgehên şoreşê, cezayên giran û bidarvekirina girtiyan ên bê sînûr li Îranê de li pey xwe bicih hêla.

Şîpela duyem" Ev Şîpela bi sedema îdeolojî û siyasî li deştîpêka dekhên 60'î de deştîpê kir û koçberên zêde ber bi Ewropayê ve çûn. Qutkirina fîzîkî, hepsên demdirêj, îşkencekirina dijberan û cuda hizir neçar kirin ku dev ji Îranê berdin.

Şîpela sêyem: Bi kom sedemên weke jiyan û xweşderbasiya baştir, koçberan beraxwe dan welatên weke Ostraliya û Kenadayê. Şîpela çarem: Bi kom sedemên siyasî û civakî ên li sala 1388'an ku rû dan, rêjeya koçberbûna welatiyan li Îranê de bi awayek lezgîn gihîşte kupikê.

Kirîzên civakî, aborî û siyasî ên Îranê piştî nerazîbûnên seranserî ên li sala 1388'an deştîpê kir, tevî wan jî, karesatên sirûştî, kirîzên weke, jîngeh, bê avî, bêkarî û deştêverdanên hikûmetê ji tev karûbarên xelkê de bû. Egera bihêz a hîloşînên civakî û siyasî li Îranê de zêdetir kirin û koma wan hemî kirîzan piştevan bû bona terkandina welatiyan.

Her sal 180 pispor Îranê bicih dihêlin û her bi vê sedemê jî Îran her sal 60 milyar Dolar ziyan jê dikeve.

Rojnameya "Şerq" di raporeke xwe de ku, li sala 1391'an weşandiye nivîsiye:



di heyamam 14 salên derbasbûyî ku ji sedî 64 xwandekarên xelkê Îranê li Olempiyadan de medal bideşt xistine Îran terkandine.

Pêka amara sekreteriya Konseya Bilind a Karûbarên Îraniyan ya li derveyî welat a girêdayî Wezareta Derve a rejîma Îranê: "4 milyon û 37 hezar û 500 welatiyan Îran bicih hêlan e. Heriwsa Yek û nîv milyon welatiyên Îranê li Amerîka rûniştine, 400 hezar welatiyê Îranê li Kananayê û 400 hezar jî li Birîtaniya de rûniştine. piştire bi rêzbandî, Îmarata Yekgirtî a Erebi û Alman jî zêdetirîn welatiyên Îranê vir penaberin.

Li ser hev 105 welat weke armanca welatiyên Îranî ên penaber hatine naskirin.

Revîna elîtan li Îranê

Li Îranê deji revîna mejiyan an revîna elîtan, koçberbûna pispor û elîtan re tê gotin ku, yek ji astengiyên civakî û aborî û perwerdehiya Îranê ye.

Sandiqa navneteweyî ya pere di rapora xwe ya sala 2009'an de ragihand ku, Îran li warê penaberbûna elîtan de di nav 91 welatan de li halê vegeşîn an vegeşînnakirinê ya cihanê de, pileya yekem heye. Wê sandiqê ragihandiye ku: Bêkarî, kêma dahatiya mamosteyan û etîlan, netevahiya malî û îdarî, kêmbûna xizmetguzariyên pisporî û zaniştî, nearamiya siyasî û civakî, ji sedemên penaberbûna welatiyên Îranê ye.

Xumeynî di axavtina xwe ya li 8'ê Xezelwera sala 1358'an de, rejîma nû a Îranê li hember kesên elît ku Îranê di terkînin, yek alî kir û ew weke îxanetker dan naskirin. Piştî şerê Îran û Îraqê, revîna kesên elît li Îranê zêde kir. Li sala 2006'an de, Mehmûd Ehmedîni-jad hin siyasetên nû û bi silogana qutkirina zanîngehan ji hebûna deştûpeywendiyên rîberal û sikolarên Rojavayî, gelek mamoste û lijneyên zaniştî ên zanîngehan neçar bi malnişîniyê kirin. Sedemên sereke yên koçkirina kesên elît bo derveyî Îranê wiha ne: Bal nedana bi esla zaniştê, bal nedan bi lêkolînan, sedema aborî: Nebûna kêrhatî bûnê, zêdexwaziya dewletê, nebûna hêviyê bi paşerojê, enflasyon û nebûna baweriyê bi xwandina bilind û avakirina hêza taybet bona ber bi pêş xistina mirovên xwe.

Car car berpîrsên rejîma Îranê behsa vekirina deriyê welat bona revîna xelkê bo Ewropayê dikin û ji vê weke amûrek givaşê lidijî Ewropayê mifahê verdigirin. Her ev jî nîşana vê yekê ye ku Îran bi deştê mafyayên çend sed kesên ku, li serweyî kupika deştîhilatê ne hatiye êxisîrîkirin, mafyayek ku heyameke zêde dîr nîne ku li welatên weke Pakîstan û Îraqê hatine Îranê û niha xwe serok eşîr û eşîrzade didin nasîn.

Îran welateke dewlemende k, dibe aramî û jiyanêke kêrhatî bo xelkê xwe ava bikira. Niha ev zêdetir ji 40 salîye ku samanên Îranê li hezaran kîlometran vêdetir bi heder diçin û ciwanên Îranê ji her rêyekê mifahê verdigrin da ku, xwe bigihîjin bi kêlegek aramn. Pir bûn û pirin yên di vê rêyê de canê xwe jideşt didin.

Nerîna Lîderan



Joseph Borrell:

“Derengmayîna zêdetir di danûstandinên Viyanayê de dê vejandina Burcamê di-jwartir bike.”



Ann Linde:

“Helwesta me ya li hem-ber PKKê neguheriye”



“Antonio Guterres”:

“Divê hemû welat rê bidin ku xwarin bigihîje bazarên cîhanê û şerê navbera Ukrayna û Rûsya di zûtirîn dem de were rawestandin.”



“Îbrahîm Reîsî”:

“Qirar wisa ye ku em biryarên tundtir bidin.”

Rejîmê dîsa lat û lût li dijî xwepêşanderan bi kar anîn!



N: Eskender Ceiferî

Wek çanda hertim a vê rejîmê, careke din di van xwepêşandanên herî dawî de jî rejîmê lat û lût ji bo lihev-belavkirina civînên nerazîtiyê bi kar anîn.

Ev jî nîşan dide ku Îbrahîm Reyîsî serokkomarê nû yê rejîmê di rêbaza çewt a bikaranîna lat û lûtan de berdewam e.

Di van 42 salan de her ji dema propagandeyên hilbijartinan ve heya hatina serokkomarekî din ê rejîmê, lat û lût, tim jî aliyê rejîmê ve ji bo tepisandina xelkê hatine bikaranîn.

Ji bilî vê, di van 42 salan de tepisandina neteweyên nefars jî her berdewam dike.

Ji sala 1979'an ve heya niha 12 gerrên hilbijartinên serokkomariyê û hilbijartinên din li Îranê hatine encamdan. Di ti yek ji wan de ti Kurdekî nekarî bibe berendamê rastîn ê gelê xwe.

Di 11 gerran de heft kes weke serokkomar hatibûn hilbijartin. Helbet deştîlata wan sînordar e û nikarin tiştekê bêjin ku li gora heza Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî nebe.

Lê ya rast ev e ku ji bo Kurdan ferqê nake kîjan hilbijartin be. Ew di bin siya partiyên xwe de, tim di van salan de hilbijartinan baykot dikan. Di salên di navbera 1979'an de heya 1981'an du kes bi navên Ebulhesen Benîsedr û Mihemedelî Recayî serokkomar bûn.

Lê serokkomariya herduyan jî netemam ma. Sala 1981'an take sal bû ku du caran li wî welatî hilbijartinên serokkomariyê hatin encamdan. Sedem jî kuştina Mihemedelî Recayî bû ku tenê kêmtirî mehekê di wê postê de bû.

Piştî kuştina Recayî, Elî Xamineyî, Ekber Haşimî Refsencanî, seyîd Mihemed Xatemî û Mehmûd Ehm-edînîjad her yek du salan serokkomar bûn.

Hesen Rûhanî jî piştî wan hat û piştî wî, Îbrahîm Reyîsî hat. Tevî ku serokkomar li wî welatî piştî bidawîhatina dema çar salên xwe, car din bi hikûmetê re dimîne, lê Refsencanî û Ehmedînîjad du ji wan kesan bûn ku piştî çend salan car din xwaştin bibin namzed lê selahiyeta wan hate redkirin.

Di hilbijarinên sala 2009'an de zêdetirîn asta beşdariya xelkê ji aliyê wezareta Navxwe ve hatiye tomarkirin. Mehmûd Ehmedînîjad wê demê karîbû tundrewan bikşîne aliyê xwe ve.

Mîrhusên Mûsewî jî ku reformxwaz bû, karîbû bi hildana sloganên demokrasîya rejîmê, gelek dangan bi deşt xwe ve bine. Lê pişt re wezareta Navxwe ragihand ku navê Ehmedînîjad car din ji sindûqan derketiye. Di wan hilbijartinan de zêdetirî 39 milyon û 400 hezar kesan deng dan ku dike 84 ji sedî kesên ku mafên dengdanê hebûn.

Di van 38 salan de gerra duyem ya serkeftina Refsencanî, xwedîya kêmtirîn asta beşdariya xelkê di proseya dengdanê de bû. Di wan hilbijartinan de hinek zêdetirî 50 ji sedî kesên ku dikarin deng bidin, dengên xwe bikar anîn.

Di deştpeka avakirina Komara Îslamî de di yekemîn gerra hilbijartinan de 124 kesan navên xwe weke berendam tomar kirin ku piştî

dayîna selahiyetan û vekîşîna hin berendaman, 96 kesan hevrikî kir. Di hilbijartina herî dawî ya 2017'an de 1636 kesan navên xwe ji bo wer-girtina selahiyetê tomar kirin lê di encam de tenê selahiyet ji 6 kesan re hate dayîn.

Gelek kesan tevî ku pêgeheke baş di nava xelkê de hebûn, lê nekarîn selahiyetê bistînin. Yek ji wan ku heya niha jî çarenivîsa wî nayê zanîn, Mesûd Recewî rêberê rêxistîna Mucahidîn li Tehranê bû.

Wî deng neda yasaya binge-hîn û ji ber vê, Rûhulla Xumeynî got ew kafir e. Xumeynî li ser serkirdeyên Kurdan weke Dr. Ebdulrehman Qasimlû jî heman tişt got tevî ku di civaka Kurdistanê de xwedîyê pêgeheke bilind bû.

Ebulhesen Benîsedir jî ku 78 ji sedî dangan bi deşt xist-ibûn, ji aliyê parlamentoyê ve di bin givaşên Xumeynî de hate dîrxistin û niha li Fransayê ye. Tevî ku Benîsedr di şerê lidîjî Kurdan de li piştî Xumeynî bû, lê di şerê Îran û Îraqê de piştî Xumeynî negirt û ev jî bû sedema dîrxistina wî ji posta serokkomariyê.

Sadiq Qutbzade ku wezîrê derve bû bi tometa hewldan ji bo derbeya leşkerî hate darvekirin. Daryûş Firûher wezîrê Kar û Karûbarên Civakî bû, hate kuştin. Herduyan jî dixwaşt bibin berendamên serokkomariya Îranê.

Mîrhusên Mûsewî û Mehdî Kerûbî jî ku di hilbijartinên sala 2009'an de berendam bûn û beriya wê jî çend postên bilind di hikûmetê de hebûn, nekarîn bi ser Ehmedînîjad de serkevin. Mûsewî û Kerûbî nerazîbûna xwe ji encamên dangan anîn ziman û alîgirên wan derketin kolanan û xwepêşandan kirin. Tevlîhevî çê bûn û ji wê demê ve ew di malên xwe de girtî ne.

Taybetmendiyeke hevpar a hemû serokkomarên rejîmê jî ew e ku lat û lûtan ji bo tepe-serkirina xelkê bikar tînin.

Projeyên Tirkîyê yê guherîna demografîkê “Jenosîd û apartîd” e



N: Ebdûlazîz Qasim

Serkomarê dewleta Tirkîya dagîrker Recep Teyib Erdogan di 3'ê Gulana 2022'an de ragihand ku, Enqere projeyek ji bo “vegera milyonek Sûrî bo bakur û rojavayê Sûriyê” amade kiriye, û ragihand ku proje dê gelekî mezin û berfireh be û li 13 deveran li wan navçeyên dagîrkirî ên “Rojavayê Kurdistanê” bên avakirin.

Di destpêkê de, divê bêjin ku plana Tirkîyê ya dagîrkirina Rojavayê Kurdistanê ji bo qirkirina gelê Kurd û pêkanîna guhertina demografiyê, û ev yek ji sereketirîn armancên Tirkîye bû her ji destpêka kirîza Sûriyê di sala 2011'an de, li ser navê “Herêma Ewleh”, ku ji aliyê civaka navdewletî ve li wê demê nehat pejirandin.

Em hemû dizanin ku projeyên Tirkîyê ne ji bo vegera penaberên Sûrî ne, ji ber ku ev navçe bi şerên giran ji aliyê Tirkîyê ve hatin dagîrkirin, bi wêrankirina gund û bajaran û kuştin û koçberkirina nişteciyên wan deveran yê resen bi taybetî li Efrîn û Serêkaniyê û Girêspî, ku bi sed hezaran welatiyên kurd ji warên xwe hatin koçberkirin, mal û milkên wan hatin talan kirin, û bi sed hezaran Erebi û Turkmen li navçeyên dagîrkirî hatin bicihkirin.

Ev tê wê wateyê ku, ew deverên kurdî yê dagîrkirî rastî koçberkirina bi darê zorê bûne, û aligirên Enqere, bi taybetî komên çete û çekdarên opozîsyona Sûriyê yê aligirê Tirkîyê li wan deveran li şûna xelkê kurd hatine bicihkirin.

Wekî me dît ku çawa Tir-



kiyê dosyeya penaberên Sûrî wekî dosyek ya bazarkirinê ligel Ewropîyan bikaranî, niha jî doseya vegera penaberên Sûrî wekî rêklam ji bo amadekariyên hîlbijartinên serokatîyê yê sala 2023'an de bikar tîne, tevî ku car hin rayedarên Tirkîyê eşkere dikin ku armanca Tirkîyê ya stratejîk ji bo dagîrkirin û guhertina demografîk ya navçeyên kurdî ye.

Parêzer Mîstefa Oso, mafnas û siyasatmedarên kurd yê serbixwe derbarê vê yekê got ku, ev projeyê Erdogan yê hat ragihandin di 3'ê Gulana 2022'an de, di pratîkê de ev çend salên tê bicihkirin, bi taybetî li herêmên kurdî yê di bin dagîrkeriya Tirkîyê de, piştî koçberkirina piraniya xelkên wê, û herwisa dibêje ku ev proje berovajî xala 14'an ya biryara 2254'ê ye, nemaze ku ti ewlehî li wan deverên dagîrkirî nîne û gelek teqîn tîne pêkanîn û şer û pevçûnên leşkerî bi awayekî berdewam di navbera komên çekdar yê Opozîsyona Sûriyê de diqewimin, zêdebarî tawanên

kuştin, revandin, îşkencedan û binçavkirinê li dijî welatiyên kurd yê mayîne li ser erdê xwe, herwisa Oso Tirkîyê wekî dewletek dagîrker binav dike û pêdivîyê wekî dewletek dagîrker kar bike û lewra guhertina demografîk bi planek metirsîdar û li gorî yasa navdewletî bi tawanên şer û jenosîd û dijemirov dide zanîn.

Derbarê vê yekê de, çavdêrê mafên mirov Ramî Ebdûlrehman rêveberê ajansa SOHR ya mafên mirov li ser pirojeya nû ya Tirkîyê ya ji bo endezyariya demografiyê ya Sûriyê, got: “ku ew aliyên dirav û pereyan didin plana Erdogan û komên leşkerî, siyasî û mafên mirovan yê girêdayî wî li bakurê Sûriyê, ku hevkarê Tirkîyê ne di prosesa guhertina demografiyê de,” bal kişand ser wê yekê ku “Erdogan û aligirên xwe yê opozîsyona Sûriyê, dê kar bikin ji bo wergirtina pereyan ji alîkariyên navdewletî ji bo pêkanîna proseya guhertina demografiyê li bakurê Sûriyê”. Hêjayê gotinê ye ku gelek alîkariyên darayî ji aliyê

gropên ser bi rêxistina “Îxwan el-mislmîn” ji Qeter û Kiwêt û dewletên erebî teneşandin bo Tirkîyê, zêdebarî metirsiya ku alîkariyên mirovî ji bo heman plana Tirkîyê bêne terxan kirin, ku di 10'ê Gulana 2022'an de, gera duyem û dawî ya kongirê Brûksel 2022'an li ser piştgirîkirina paşeroja Sûriyê û navçeyên derdora wê birêve çû, ku tê de dewletên “xêrxwaz” alîkariyan bidin xelkê Sûriyê yê li hundir û derve bi rêya saziyên Neteweyên Yekbûyî”, ku Elmanîya 1.3 milyar € terxan kiriye, Amerîka 800 milyon \$ terxan kiriye, Siwêd 69 milyon \$, kiwêt 200 milyon \$, ku Josep Borrell Serokê Komîsyona Ewropî di (9'ê gulanê) yekem roja kongirê Birûksel de tekezî li ser pêwîstiya misogerkirina gihandina alîkariyên mirovî bo “bakurê rojavayê Sûriyê” kir, bi vê wateyê ku ev dewletên qaşo “xêrxwaz”, û tevî NY dibin hevpar û gunehkarên tawana guhertina demografîk û raguhestin û koçberkirina miletê kurd in.

Leşfirotin an laşkirîn?



N: Vênûs Fayîq

W: Hesen Mukerem

Tev coreyên tēkiliyên li ser nivînanan kiriyarên hevparin lē, li derveyî jiyan pēk anîn û bona peydakirina pere weke kiryarēk bi wateya jineke pîs û bē exlaq hatiye pênasekirin ku, jēra laşfirotin tē gotin.

Li halekê de laşkirîn jî jixwe digire, çimkû ev kiryara du aliye, eger qerar be kiryarēk qirêj be û yasa û şer`i cezayê bo bibirin, ewa gelek nedad-perwerane ye ku mēr jê tē derxiştin, eger jî bi sedema vē kiryarē jinek raştî nifirēt a yasa û şer`i û civakê bē, di demek wiha de dibe mēr jî her bi hemen awayî nifirikirî û bēnamûsê bē pênase kirin.

Bi vē mebestê ku, wē kiryara weke tawan havêjin bi stûyê jinekê, jî warê ziman ve jî berevajiyê piraniya herî zêde a zimanên cihanê, navê (laşfirotin) li ser danîne, wate regeza mē hatiye naskirin, di demekê de bi zimanê Erebi jêre îşeke dibêjin(Di`are) wateya regezê nedayê û bi zimanê Îngilîzî jî jêre dibêjin Prostitution û bi hemen awayî navê wê îşeke ye, neku li ser navê jinê binav kiribin. Pirsyar: Çima jin laş froş e?" Û herwisa beramberî wê "çima mēr laş dikire?"

Herdu ji wan di yek dema dîrokê de hemen rehenda exlaqî û civakî ya wan heye, bi codahiya şert û mercan û ji ber çagirtina ew laşê difiroşê û yê din jî laşê wê dikire, li dervey her sedemekê. Ev gotara berevanîkirin ji laşfiroşî û kardarê laşfiroşiyê nîne, dîtingehēk cuda ji aliyê din ve bona diyardeya vē jêre dibêjin "laşfirotin". Niha mesele eva nîne ku

kê firoşyar û kê bikirê laşê, mesele bitaybet rehenda exlaqî a vē ye. Çima laşfiroş tawanbar û heyaçûyî û namûs şikeştiye lē, bikir ti carî ji çavê diyar nîne û raştî hesabên vekolîn û yasaya cezayê û nifir lēkirî nabe? Piştire jî bikirên laşê jinan bixwe yan kes-ûkarên wan ji wan re li pey binamûstirîn jin digerin bona vē ku, digel de jiyana hevpar pēk bîne. Û ti mirovek wiha behsa wan nake ku behsa jinekê tē kirin. Yan eger xwediyê xîzan be gelek bi hêsanî diçe mala xwe li himbêza hevjinā xwe de radikeve bi bē ti tirsek ji encama wan kiryarên xwe. Eva esasa sîsteyam exlaqî û yasayî a wê ye ku, ayîn tē de bûye kultûr û bingeş bo yasa darêtinê. Niha pirs eve ku: Çima jin karê laşfiroşiyê encam dide?

Pirsek exlaqî û mezin e, jî aliyê din ê meselê cuda nîne hemen pirs ku çima xort laş dikire? Pêka vē yekê dinavbera jin û mēr de peywendiya seksê di her çarçoveyî de be, kiryarēke mirovî û hevpare, ti yek ji wan bi bē hebûna yê din nikare kiryara seksê bi tevahî encam bide. Her di vê derheqê de ayîna Îslamê ku daxwaza kevirbaran kirina jina zinaker/laşfiroş kiriye, heta niha nehatiye dîtin ku ti mērek bi tawana kirîna laşê jinê bē kevirbaran kirin. Bi mercên ku di cihanê de bandên laşfiroşiyê birêve dibin pirraniya wan mēr bin, heta bi zorê wî karî li jinan didin encam dan û zef ji wan jî bi wî karî bazirganiyê dikin. Gelek ji wan mēran jî di nav civakê de xwediyê cih û pēgehane û bona qazanc û peyda kirina pere li ser navên cuda û li cihên taybet bi karên wiha, û demaku digihîje bo cezadanê tenê jin ceza ber dikeve.

Lêkolînkirina li derheq wan sedeman wisa li jinê dike ku, bo her sedemekê be dibe ku yeke ji wan dabînkirina bijêva jiyana rojane be, berpirsariyê gelek ji vê mezintir ku tenê aliyê

derve yê wê diyar dike bibînin û tawanbarek ku li pêş çavê me qît be ev jî jin e. Ev core lēkolîna ku xwe dispêre ayîn û yasayek ku di nav çandek mēran de ye û zêhiniyetk mērane ku tev maf dane bi mēran û bona paraştina şerefê jin li hûndirî sandîqekê kiriye, lēkolînek ne exlaqî û dūr ji nîrxên mirovahiyê ye. Beriya nîfîrkirina fahîşeyê, divê sedem bi awayekî realîs û etîktir bēn naskirin û li ser faktor û mebestan bisekinin, çimkû tu nikarî ji ber laşfirotinê jinê desteser bikî eger rê ji laşkirînê neyê girtin. Nabe kiriyar di hewldanên xwe yên ji bo plansazikirina keç û jinan de berdewam be û ti cezayê jî nebîne. Her çawan ku ti carî nikare bo laşfiroş sînûr diyar bike eger civakek hişyar û radîkal û sîstemeke tevaw sekolar nebe tev tiştan bi yasayê rêkbixîne nek li gor deqa ayîn ê.

Serokwezîrê Holandayê kongereke civînên rojnamevaniyê de li serobendên sivi-kikirina mercên xweparêzî û rê dan bi vekirina bazar û salonên mesajê û melekirinê îşare bi cihên laşfiroşiyê jî kir, çimkû, eva raştîyeke û kirdara laşfirotinê jî dîrokke ewqas kevin heye ku bi hêsanî nayê jina birin. Lē, Ewropî gihîştine wê baweriyê ku her karek bi yasayê hate encam dan û bac li ser karmend û kardêran were sepanandin tev dē di bin kontrola wan bixwe de be. Bilî ji vê di wan welatan de hişyariya civakê gihîştîye vê astê ku ev jinên ku wî karî encam didin û dixwazin dev jê berdin, çendîn dezgeh û saziyên taybet hene ku, bi awayê zaniştî û insanî digel wan mi`amlê dikin û wan bi komek meşq û deverên xwe nûkirin û goncandina dinav civakê de perwerde dikin, neku wan dinav girtîgena havêjin û ji aliyê polîsan ve bi zorê destdirêjî li ser wan bē kirin, çimkû, cem wan nîrx û bihaya insanî li serweyî hemû tiştî ye û ya ku cem wan jêre dibêjin şeref tişteke nîne ku dinav lingên

jinan de be.

Ez bawerim ku niha li Ewropayê bi rêjeyek xuya û li rojhilatê jî çiqas jinên laşfiroş hene ewqas mēr jî hene ku laşê xwe difiroşin, helbet, ji jinan re pere didin, lēbelê, li welatên weke welatê me de, diholā ku ji jineke laşfiroş re lēdixin rengê wan diholan nade ku, bo xortekî laşfiroş lēdixin. Heta eger haletên nêrbazî digel laşfiroşiyê hevber bikin, ez nebawerim ku kēmtir be ji haletên destdirêjiya li ser keçik gelek temem kēm jî. Jinên laşfiroş hertim nifir ji wan hatine kirin, lē, ti kes fokos nake li ser laşkeran û qala wan nakin. Çimkû piraniya wan bi awaekî di bin baskên desthildaran de paraştin e. Li Ewropayê karê laşfiroşiyê ku kareke yasayî û rêkixiraî ye, kiryarēke li ser heza mirov bixwe ye, nek bi zorê, çimkû hemû karekî bi zorê cezayê yasayê û kêrhatî jê re hatiye dîtin.

Heta corek ji laşfiroşiyê serî rakiriye ku, şewaza edetê xwe derbas kiriye ku, mēr laş wan jinan dikirin ku li warê naskirinê de wan li civakê û li ser torên soşyal medyayan de navûdengên xwe derxiştine û li ser navê hunerê navûdengê xwe pē derdixînin, û herwisa bi haydariya çendîn dezgehên hunerî ku rege berprisên hizbî û kesên xwedî desthilat li pişt berdê mifahê jê verbigirin. Virda mesele gelek ji vê berfirehtir pel havêtiye demaku tenê jinek be karê laşfiroşiyê encam dide, ev yeka tirsnahtirîn şewazên vê yekê ye ku jêre laşfiroştin tē gotin.

Di dawiyê de eger jinek bixwe li ser heza xwe laşê xwe difiroşê, bi hezaran keç hene ku bi zorê dane bimēran û ev jî bi zorê digel wan seksê encam didin, ji ber dijiwariya jiyana aborî û nebûna dahat û deştênbgîya kesûkarên wan li hember wê ku nan bixwen û bi mērekî di bin kavilê de bimînin û bi darê zorê digel wan seksê encam bidin, navê vê yekê çi dabinên?

Hişmet Rawek: «Partiyan roleke bandordar hene bona ber bi pêşveçûn û parastina nasnameya neteweyan»

Min digel Hişmet Rawek pêşmerge PDKÎ hevpeyvînek pêk anî navbirî di hevpeyvîna de got ku: “Partiyan roleke bandordar hene bona ber bi pêşveçûn û parastina nasnameya neteweyan.”

H: Hesên Mukerem

P: Berî her tiştî ji kerema xwe xwe ji me re bide nasîn

B: Navê min Hişmet Rawek e û naskirî bi Şaho. Li sala 1370'an li gundê Dewan a girêdayî bajarê Pawe jidayîk bûm e. Min xwendina destpêkî li gundê xwe yanî her li Dewanê qetand û Dibistana Navîn û ya Bilind jî, li bajarê Pawe qetandîye, û herwisa bawernameya Karnasiyê li beşa Endazyariya Myîmariyê jî li parêzgeha Kirmaşanê qetandîye. Û niha jî ev nêzî 3 salane ku, li nav refên Hêza Pêşmerge Kurdistanê me.

P: Rêzdar çawan bû we biryar standin ku tevî refên Pêşmerge Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bibin?

B: Nasnameya neteweyî, pêk tê ji nasname yan heşt li herheq neteweya te xwe ku, li kultûr, edet, ziman û siyastê de xwe nîşan dide. Hişyarbûn û îhsaskirina bi cudahîdanîna dinavbera gelê me û gelên din de nîşan dide ku, rewşeke wiha girê bide bi nîştimanperweriyê. Her takek bi nasîna neteweya xwe wan hizir, bawerî û nîrxên neteweyatiyê watedar dizane û bi awayek berdewam di jiyana rojane ya xwe de wan bikar tîne.

Hemû mirovek heta eger nexwandevan be jî lê, îhsas bi hebûna nasnameya xwe dike, wê demê hizir ji vê dike ku niha di çi rewşekê de ye. Demaku rewşa neteweya xwe weke rewşa neteweyên din dibîne û serdestiya zal bi hemû awayî û bi şewaza sistematîk hewla jinavbirina wê/î dide. Û jiber hindê jî, dibe pêşî ji vê yekê bigire.

Yekem car ji rêyên medenî ve çalakiyan lidarbixî û ber-evevaniya mafên xwe bikî an jî rêya partiyên siyasî ve dibe ku li dijî vê desthilata zal û ser hişîk têkoşîn dikin û ji tev dîtingehan ve di raştîyê de şer nasrîntirîn û xerabtirîn ji wan haletane ku eger mirov bixwaze encam bide.

Partiyan roleke bandordar hene bona ber bi pêşveçûn û parastina nasnameya neteweyan û herwisa nûnerê wan civakanin û her partiyek dîrokek taybet bi xwe heye û têkoşîn û eniya xebatê diyar e. Yekem ji wan partiyan Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ye ku, dîrokek pîroz di tevgera rizgarîxwaziya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de heye.

P: Li herêma we li cihê ku hûn vir jidayîkbûne aştî hişyarî û agahbûna ciwanan û xelkê li derheq mafên neteweyatiyê de çawaye?

B: Niha weke dehkên berê nemaye ku, aştî hişyariya xelkê li xwarê be. Serdem serdema modernîte û cihanîbûn û vegeşîna zanyariyan li civaka Kurdî de û herwisa ciwanên Kurd jî parekin ji vê cihanê. Eger li serhev behs bikin li derheq hişyarbûn û mafê neteweyatiyê de di asteke bilind de ne. Civaka me di bin sistema dagîrker de ye, bi awayek ku her core zanişt dibe di çarçoveya sistema desthilatdariya rejîma Îslamî û ev şewaza hizrikirina ku ev dixwazin bibe. Liçav cihên din ên Îranê, civaka Kurdî û ciwanan hişyariyek xuya hene ev jî, vedigere bo li ser ev îhsaskirina li derheq nasnameya neteweyî û piştîre rol û bandora partiyên Kurd. Her ev yeka wisa kiriye ku civaka Kurdewarî zêdetir hizirek siyasî û ramanên taybet ên din hebin ku her eva jî pirekê çê dike bona gihandina her core zanyariyek ku li derheq mafê neteweyatiyê de bibe. Tevî vê rewşa han jî ku rejîmê bo xelk afrandîye, bi awayek berdewam ciwanên



Kurd ji rêya medyayan ve xwe nû dikin û beşdarîkirina wan di xwanîşandanan de an bangeşe kirin, hilkeft-eke neteweyî û berevanîkirin ji kultûr, ziman û ... hwd, ewane nîşana aştî hişyarîbûna netewatiyê ye.

P: Li herêma we xelk heta çi asteke bona hînbûna zimanê dayîkê hewl didin?

B: Zimanê dayîkê, mirov li dema jidayîkbûn hîn dibe. Virda tak dikare bi ti arîşeyekê peyama xwe bigihîne û zanişt û zanyariyan lezgîntir dike. Perwerdehiya bi zamanê dayîkê roleke girîng heye li ser parastina nasnameya neteweyî. Sistema zal ji bo vê yekê ku yek ziman û yek neteweya xwe berfireh bike û digel tev neteweyên din cihgîr bike pêşî ji wan karan digire.

Liser hev li parêzgeha Kirmaşanê ku, ji sedî 95 welatiyên wê Kurd in li tevahiya xwandingeh û zanîngehan de perwerde û ders gotin bi zimanê Kurdî qedexe ye û nabe bilî zimanê Farsî ti zimanek din bikar bînin. Di halekê de ku madeya 19 a yasaya bingeîn a Îranê îşare bi vê yekê dike ku xelkê Îranê bi bê guhdan bi netewe û eşîr, mafê wekheviyê hene û reng û regez û ziman û hevşewê nabin po'an. Tevî vê jî, ji ber wê yasayê ku esla 15 a yasaya bingeîn rejîma îslamî, cîbicî nakin ev dîrin

li her cure hînbûna bi zimanê dayîkê li çarçoveya yasa û xwandingehan de. Lê, hevdem xelk di wan navendên ku zimanê dayîkê fêr dikin gelek baş beşdarî dikin.

P: Dawîn pirsyar, we bo ciwan û xelkên Kurdistanê çi peyamek heye?

B: Qada ciwan, li her civakê de girîngtirîn saman û hêza vê civakê ye ku zêdetirîn û mezintirîn gunherînkariyan pêk tîne, ciwan li barê amadehiya hizirî û fîzîk ve, hizir û amadehiyek nû heye û weke dahênerên civakê ne. Ev li dijî hizir û sistema desthilatê kar dikin û xwazyarên wan guherînkariyan in ku, digel vê serdemê nagoncin û dixwazin civakê ber bi pêşve bibin. Di pîrsa duyem de min behsa nasnameyê kir ku pîrseke girîng û bashilgîre û mirov xwe dibîne.

Her bi vê sedemê ye ku hewce ye ciwan aştî zanyarî û hişyariya netewatiya xwe bibîne serê. Dikarin beraxwe bidin bi dîroka ne ewqas dûr ku li dema desthilatdariya hikûmeta Paşayetiye de tevî wan hemû zilm û zordariyan, silogana yek netewe û yek ziman ku dixwastin neteweyên din jinav bibin û şoreşa gelên Îranê serî rakir û qada ciwan roleke berçav lîstbûn.

Her li niha de, hem xelkê rojhilat û hem jî qada ciwan aştî hişyariya neteweyîbûna wan li serê ye û şeqam, zanîngeh û xwandingehan dikarin wan cihan bikin bi meydana têkoşîna civakê ku beşek zêde a ciwanan berdewam li dijî pîlan û kiryarên metirîsîdar ên rejîmê sekinîne, her li demaku rejîmê xwaştîye pîlanên xwe cîbicî bike wan bi gotina na refrandom û vê yekê jî em dibînin ku bi bilind ragirtina hilkeft, xwenîşandan û hêmayên neteweyî, wan selmandi ye û Hêvîdarim ev rola ku niha hene bandordar û bihêztir jî bikin.

Binpêkariyên mafê mirovî di Kurdistanê de

So`ida Xedîrzade dawî bi gireva dermanî û birçîbûna xwe anî

“So`ida Xedîrzade” jina ducanî a binçavkirî ya xelka bajarê Pîranşehrê, piştî 12 roj gireva dermanî û birçîbûnê, li ser soza berpîrsên girtîgeha bajarê Urmiyê, dawî bi gireva xwe anî

Yek ji xizmên nêzîk ê wê welatîyê bi Ajansa “Kurdpa”yê re ragihand: “So`ida Xedîrzade” li ser soza berpîrsên girtîgeha bajarê Urmiyê li derheq azadkirina demkî ya bi danîna barimteyê, dawî bi gireva xwe aniye.

Herwisa wê çavkaniyê basa vê jî kiriye: “Tîma pizîşkî ya wê jina ducan, tekezî li ser vê kiriye ku mana wê jinê di girtîgehê de pîrsgirêkê bo wê diruşt dîke û rapora peywendîdar li vê derheqê bo pizîşkê yasayî şandiye”.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Li heyama heftiya derbasbûyî, ew jine di bin tedawiya pizîşkî de bûye û dema zarokbûna wê nêzîk e. Roja Sêşemî 6`ê Banemerê “So`ida Xedîrzade” ya xelka bajarê Pîranşehrê ku ducanî ye û binçavkiriya benda jinan a girtîgeha bajarê Urmiyê, dest avêtibû gireva derman û birçîbûnê.

Saziya Lêbûrîna Navnetewî bi berteknîşandaneke li derheq rewşa tenduriştiya “So`ida Xedîrzade” ragihand: “Binçavkirina “So`ida Xedîrzade”yê digel pîverên dadresiya dadwerane dijayetî heye û di dîdingeha yasayên navnetewî de, ew kare xweserane tê hesibandin.

Berê, ew welatiya di du nemeyan de, ji dadsitanê Pîranşehrê daxwaza azadkirina demkî bi danîna barimteyê kiribû, lê dadsitan û lêpîrsê dosiyeya wê jinê digel wê daxwazê dijayetî kiribûn.

“So`ida Xedîrzade” di wê daxwazê de ragihandibû, ku niha li rewşek nebaş a girtîgehê de ye û bi sedema ducanbûn, givaşxwînê, jana gurçîle û dîska piştê û nexweşiya hinavê, man di girtîgehê de jiyana wê xîştîye metirsiyê.

Roja Duşemî 17`ê Xezelwera sala 1400`an a Rojî, “So`ida Xedîrzade” ji girtîgeha Îtila`ata Spaha Pasdaran bo girtîgeha wî bajarî hatibû veguhasîn.

“So`ida Xedîrzade” di heyama binçavkirinê de ji “çavpêkevtin digel malbata xwe” û “destpiraghîştin bi parêzer” hatibû bêparkirin.

“So`ida” Xîzandar û xwediyê 2 zarokan e.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser navbirî de hatiye sepandin ti zaniyariyek ji ber dest nine.

Îbrahîm Tarîmuradî bona birêvebirina cezayê xwe hate gazîkirin

Welatîyekî Kurd ê bi navê “Îbrahîm Tarîmuradî” kurê Mihemedsalih û xelkê gundê “Hemrole” yê girêdayê bajarê Sineyê bo birêvebirina cezayê xwe hate gazîkirin.

Ew welatiye li gor banghênameya ku roja Duşemî 26`ê Banemerê ji aliyê taya 4 a Birêveberiya Cezayê Keyferî ya bajarê Sineyê vergirtiye, divê 10 roj piştî vergirtina banghênameyê xwe bi Birêveberiya Cezayê Keyferî ya bajarê Sineyê bide nasîn.

“Îbrahîm Tarîmuradî” bi tohmata “propagende li dijî nizam û peywendî û hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî yê dijberî hikûmeta Îranê” ji aliyê taya 1 a dadgeha Şoreş a bajarê Sineyê ve, bi serokayetiya dadwer “Se`îdî” bi yek sal girtîgeha te`izîrî û 30 milyon Tumen cezayê nextî hatiye cezadan û ew cezaye roja Çarşemî 20`ê Rêbendana sala 1400`an a Rojî, bi awayekî fermî bi navbirî re hatiye ragihandin.

Roja Yekşemî 4`ê Xezelwera sala 1400`an a Rojî, ew welatîyê Kurd bi danîna barimteyê bi awayekî demkî heta dema bi dawîhatina qonaxên dadresiyê ji girtîgeha bajarê Sineyê hatibû azadkirin.

Ew welatiye di heyama binçavkirinê de ji mafê “hevdîtin digel malbata xwe” û “destpêregihîştin bi parêzer” hatibû bêparkirin û piştî bi dawîhatina heyama lêpîrsînê, navbirî ji girtîgeha îdareya Îtila`ata bajarê Sineyê bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hatibû veguhasîn.

Êvareya roja Şemî 2`ê Gelawêja sala 1400`an a Rojî, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyên yasayî êrîş kirine ser mala “Îbrahîm Tarîmuradî” û piştî vekolîna mala wî, navbirî binçav kirin.

Hêzên ewlehî dema vekolîna mala wî welatîyê Kurd, dest bi ser hin ji kereşteyên kesî yen navbirî de girtin û digel xwe birin.

Wêne: Bi dawîhatina dewreya destpêkî ya Hêza Pêşmerge Kurdistanê

